

Kurmê darê ji darê ye!!

Rêberê Silfvî

Li darê dinê, tu kes mîna me Kurdan dilpak, dilsoz û belengaz tune ye. Ji stranên folklorî û rûpelên dîrokê tê zanîn ku zû em bi çiv, vir û derewên xelkê hatine xapandin, azadiya xwe winda kiriye û me baca wê xwîna dilê xwe daye. Baweriya me bi virên wan hatiye, ji wan bawer kiriye û bûne qurbanîyên kîn û zikreşiya wan. Weke mînakeke dilêş, li rojhilatê Kurdistanê, Riza Behlewî yê farisî digel dora sed siwarî dikeve qevda Simko Axayê Şikakî. Tevî ku ew neyarên hev bûn, bi hev re di şerekî giran û dijwar de bûn jî, Simko Axa ew aniye mala xwe, bi şîv, xwarin û vexwarin kiriye û xinizî pê re nekiriye. Lê, em tev dizanin çawa ku dema keysa Riza lê hatiye, dema jê re şandiye ku ji bo çareseriya doza kurdî ,ew dixwaze wî bibîne û diyalogê pê re bike. Di heman demê de, ji bo kuştina wî pilan daniye, leşkerên xwe di newalekê de li pêşiya wî veşartine û bi xinizî wî serokê Kurd ê payebilind kuştîye, li seranserî Îranê bûye şahî û li Kurdistanê jî şîn û girî...!! Herweha, Dr.Ebdurehaman Qasimlo, Sadiq Şerefkendî û gelekên din bi dek û dolabên neyarên gelê me hatine kuştin.

Dema tu bixwazî malbatekê ji hev belav û taromar bikî, gumanê berde wê malbatê!!...Nema baweriya kesî bi kesî tê, her endamek xwe mîr û mezinê êlê dibîne, li gotina mezinên xwe guhdar nake, neyar nexweşî, bêbawerî, belavbûn û mirina reş

tê de cîwar dibe. Di dîroka gelê me de gelek nimûneyên balkêş di vî warî de hene, yek ji wan: Dema Imperatoriya Osmanî û Sefewî ji bo şer û tunekirina Kurdan xwe kirine yek, Kurd şikandine, Xanoyê Çengzêrîn digel efser û serleşkerên xwe di kela Dimdimê de ,berevanî û pêdarî kiriye, dike nake nikare derbasî wê asêgehê bibe. Di tariya şevê de, xinizekî Kurd xwe digihîne neyaran û ji wan re dibêje: Xano gelek zad, qût, xwarin û vexwarin ji bo rojên wilo hilaniye, bi şer jî hûn nikarin kelê bigrin, lê ez dizanim hûnê çawa kela Dimdimê dagîr bikin!!.. Jê dipirsin çilo, çawa ...Ew dibêje: Herin kaniya avê gemar bikin, ewê ji têhna bimirin, hûn ê Xano mîna kewekî bigrin!!!..Wilo dikin û kelê zeft dikin lê xweşmêrê Kurd Xanoyê Çengzêrîn xwe dikuje û bi saxîftî xwe naspêre neyaran!!.



Bi vî hawî, Yezdînê şêr jî şoreşa Bedirxaniyan şikandiye. Herweha gelek êl û eşîrên Kurdan li hember şoreşa Şêx Seîdê Pîran şer kirine, ji Ataturk re bûne peyane erzan û şoreş Kurd a pîroz têk birine, paşê Mustafa Kemal serê hina ji wan firandiye û hin jî bi werîsên sêdaran xeniqandine. Ango mirov dikare bibêje kurmê darê ji darê ye û her em ketiyên nezanî û bê tîfaqê ne, nezanî û bê tîfaqa me bûye buhara dilên neyarên hebûna me.

Şemî 18.08.2012